Nîsan BAHOZ 1971
Rêxistina Têkoşer û Şoreşgerên
8 KURDİSTAN

Bahoz, piştî rawestîna yek deqîqe ji bo Şehîdên KURDİSTAN, di 9.4.71 de dest bi Kongra xwey III. a salî kir û di 11.4.71 de bi girtina van biryarên jêrin, bona pêşkeşkirina gelên Cîhanê, civînaXWE kutayî anî:

1) Kongre, ji Şoreşa Kurdistana-Nîvro, serekê wê ê mezin General BARZANî, Pêşmergeyên leheng, û Partîzanên (PDK) Wê re girêdana xwey germ, silav û daxwazên serketinê pêşkeş dike.
Herwaha PDK-ên di Parçe-Kurdistanên din de di bin nîrên Zînat, Guvaştin, Girtîgeh û her reng êşandinan de têkoşîna xwe dom dikin re daxwaza seketinan pêşkeş dike û hevaliya xwe a herdemî bi wan re dide xûyanîkirin.
2) Kongre, piştgîriya Hevhatina 11 Avdar 1970, a ku ewtonomiya Kurdistana-Nîvro naskir, dike û vê serketina Şoreşa Kurd li Îraq dizane.
Paşê kongre, ji herdu aliyan, di demek kurt de, cîanîna vê Hevhatina ku li Îraq ê bibe hîmê Komarek Kurd-Ereb a bi rastî Serbixwe û Demokratî-Gelî, pêwîst dibîne.
Kongre, "Lêbibhorîna Giştî" a ku Serektiya Şoreş derxist, rast dibîne.
3) Kongre, ji bo gelên Cîhanê, dide xûyanîkirin:
ku "Hikumeta Reformîst"(!) li Turkiyê, a bi ûltomatoma 12 Avdar 1971 hate ser hikum, ne tiştek e bêtirî eşkerebûna Faşîzma Veşartî;
ku bi destê leşkerê Tirk ê faşîst,Şovennîst û riçperest hate ser hikum ji bo li navrakirina maddeyên Qanûna-Esasî ên azadîdar û pêşverûyî;
û dîsan ku ne tiştek e bêtirî daxwaza leşker bi virrên Kemalîstî, ku ji bîr û baweriyên"İttihat-Terakki" hatine girtin, menfaetên borjuvaziyên xwe (Tirk) biparêzin û bi zora sûngûyan hêzên gelên Turkiyê ên Şoreşgêrî berbend bikin.
Kongre silavên xwe pêşkeşî birayên xwe ên xort û têkoşer dike ku li ser doza Junta faşîst û şovenîst bi tawanbariya "Komonîstî û Kurdayetî" hatibûn girtin û ta niha nehatine berdan.
Ser de jî lanet ji van kirinên han dibarîne ku bi navê "nîzama qanûna esasî û demokratî","yekitiya welêt" û li dijî "qelskirina gelparêz"têne kirin.
Kongre bi hişkî û nefret dengê xwe li dijî leşkerê Tirk ê xwînmij, sadîst û faşîst bilind dike ku pêşiya kirinên komandoyên riçperest û şoven li Kurdistana-Bakur nagre û her ku diçe bi vacayî wan bêtir dike.
Kongre di wê baweriyê de ye ku hemû rêxistinên pêşverûyî (ên herrengî) li Turkiyê,bi piştgîriya wergera hikumetê bi destên leşker ji bo anîna faşîzma xwey vekirî, ketin çewtiyek pirr mezin.
Kongre, gişt rêxistinên pêşverûyî, ên ku piştgîrî an jî alîkariya têkoşîna gelê Kurd dikin, sipas dike.

4) Kongre lanet li rejîma Şah, a paşverûyî, dibarîne ku di van rojên dawî de 16 Kurdên gelparêz û şoreşgêrî kuşt û bi hezaran şoreşgêr (Kurd,Fars û Azerî) di zîndanan de diêşîne.
Kongre piştgîrî û doza pêkanîna yekitiya gişt rêxistinên Îranî, ên pêşverûyî dike ku ji bo pêkhatina demokratiyek netewî û serbixwebûna gelên Îran têkoşînê dikin.

5) Kongre dide xûyanîkirin:
ku "Kembera Erebî", a ku partiya Beesî Surî li Kurdistana-Navîn bi kar tîne, pîlaneke ku mafên merovtî dide bin lingan û li navrakirina neteweki ye û hovberiya çavsorî ye.
Kongre rawestandina van pîlanên nemerovtî, rakirina "Kembera Erebî", vegerandina mafên Rûniştvanî û dayîna mafên Kurd ên bingehî-gelî-civakî û rêzanî doz dike.

6) Kongre ji bo rêdana PD-Kurd, naskirina gişt mafên civakî-gelî û rêzanî û dayina mafê Rûniştvanî ji bo 23 000 Kurd, sipasî karbidestên Lûbnan dike.

7) Kongre ji Serketinên gelên Rojhelata Dûr, Navîn û Mêzîk, Efrîka, Ewropa û Latîn-Emerîka re, ñ ku li dijî împeryalîzm ji bo Serxwebûn û gişt mafên xwe ên gelî-civakî (çekdar an demokratî) têkoşînê dikin, silavê xwe dişîne û piştgîriya xebata wan dike.

8) Kongre bi hişkî dengê xwe li dijî wan hikumetan bilind dike, ku alîkariya leşkerî, ku li dijî gelê Kurd bi kar tên, didin hikumetên ~~paşverûyî-faşîst~~ û riçperest, ên ku Kurdistan di nav xwe de bi zordarî parve kirine.

9) Kongre li dijî wan rêxistinan dengê xwe bilind dike û vegera wan ser Pêwestiyên xwe doz dike, ku bi ramanên aşitî, alîkariya civakî pêkhatine (wek UNO), lê destgirêdayî ji hovberî, êşandin û zînata ku li gelê Kurd dibe temaşe dikin.

10) Kongre, gişt rêxistinên (siyasî û nesiyasî) ku ta niha piştgîriya Têkoşîna gelê Kurd (a çekdar û demokratî) kirine, sipas dike.

---

Ev biryarana bi zimanê kurdî, tirkî, înglizî û elmanî hatin çap kirin û belavkirin.

B A H O Z
Rackarbergs, g. 80
75232 Uppsala-Schweden